hejmar 1 havîn 1987

KURMANCÎ

rojnameya taybetî ya Enstîtuya kurdî ya Parîsê li ser pirsên zaravê kurmancî

Min ev nivîsî ne ji bo sahibrewacan
Belkî ji bo biçûkêd Kurmancan

Ehmedê Xanî
(Sedsala XVII)

NÛKIRINA KURMANCÎ

Kurmancî zarekî gelekî dewlemend e. Di hin warên jiyana rojane de, di peywendiyên bi xwezayê (tabîetê) re, peyvên wê ji yên zimanên mezin ên ewropayî kêmtir namînin. Mesela ji bo navên pez û dewaran, ji bo navên dengên tişt û heywanan de ew ji fransizî û îngilîzî jî zengîntir e. Ew berî rûsî û zimanên slav ên din bûye zimanekî edebî û hê di sedsalên XIV û XV de berhemên giranbiha dane.

Mixabin, ji bo sedemên siyasî, ji ber bindestketina gelê kurd û parvekirina welatê wî, rê li ber vê pêşveçûyina dîrokî hate bestîn, an asê kirin. Kurmancî wilo bê xweyî, li jêr êriş û gefên çandên biyanî kete sedsala XX an, ya nûjeniyê (moderniyê), ya rojname, radyo û televizyonê. Bi awayê ku civaknas dibêjin mirovahî di heftê salên dawîn de ji heft sed salên berê bêtir veguherînên civakî (sosyal) û çandî (kulturî) derbas kiriye. Çerxa dîrokê bereberê zûtir digere, bergehên mirovan frehtir dibin, nûyîtî li çar aliyên cihanê zûtir belav dibin, dinya hin bi bin "biçûktir" dibe. Di vê meşa han de qels, kulek, brîndar, naamade dikevin, û hin ji wan jî ji rûpelên dîrokê winda dibin.

Ji salên 1920î ve Kurdên Iraqê karîne bi kurmanciya xwarê ango bi "soranî" binivîsin, pirtûk, kovar û rojnameyan derînin. Zaroyên wan di xwendegahên despêkî û navîn de zimanê xwe yê dê dixwînin, di radyo ûtelevizyonan de bername û weşînekên "soranî" hene. Zimannasên kurd ên îraqê bi salan li ser pirsên rastnivîsîna "soranî" xebitîne, hê jî dixebitin. Lewre rewşa van ji ya kesên ku bi kurmancî dipeyivin (Kurdên Tirkiye, Sûrye, û yên bakura Kurdistana Îran û Iraqê, tevhîhev bêtirî 65% ê gelê kurd) pirr baştir e.

Xebatên ku di salên 1930-1940î de Kamran A. Bedirxan û Celadet Bedirxan pêk anîne ji bo rastnivîsîna kurmancî gaveke hêja ne. Lê pêşvebirin û kûrkirina vî karî ferz e, pirseke jindarî ye. Heke rojekê li perçeyeke Kurdistanê gelê kurd bigihê azadiya xwe, wê demê dê Akademiyeke ziman, bi riya imkan û dengaziyên dewletê (radyo-televizyon, rojname, xwendegah) li ser pirsên zimên biryaran bistîne û wan biryaran bide qebûl kirin. Lê ev roj dê kengî bê diyar nîne. Heye ku ta wê rojê, li jêr tesîra televizyon û xwendegahên tirkî û erebî birrekî mezin ê gelê kurd kurmanciya bav û kalên xwe ji bîr ke an jî tenê zimanekî jarketî, tevlihev bipeyve. Kurmancî jî bibe wekî zimanên îrlandî, welşî an brotonî, zimanekî "folklorî" ku tenê carna di govend û dîlanan de tê bi karanîn.

Welatparêzên xwedî berpisiyar, nemaze xwenda û ronakbîr, li ber sernivişt û qederê serî natewînin, wekî berxên sernerm li hêviya kêra qesab namînin. Parastina zimanê pêşiyên me bingehê evîna welêt e, rehê jindarî yê welatparêziyê ye. Lewra divê ku her Kurdê welatparêz li gora karîn û zanîna xwe beşdarî vî şerê parastin û nûkirina kurmancî bibe.

Ji bo nûkirin û dewlemendkirina kurmancî Enstîtu salê du caran, her carê hefteyek nivîskar, zimannas û rojnamevanên kurmanc ên ji hemû navçeyên Kurdistanê dicivîne. Ew di her civînekê de li ser peyvnasiya (terminolojiya) şaxeke ziman dixebitin. Civîna bihara 1987 li ser rastnivîsîna navên rojan, mehan, hejmaran û li ser navên coxrafî xebitî. Biryarên vê civînê di rûpelên vê rojnameyê de tên belav kirin. Ewê heya payizê Enstîtu xarîteyeke cihanê û yeka Kurdistanê bi kurmancî çap bike û bixe nav xelkê.

Di vê civînê de pisporên kurd ên ji navçeyên Agirî, Şapûr (Kurdistana Îranê), Akre û Kerkûk (Kurdistana Iraqê), Hekarî, Diyarbekir û Mêrdînê (Kurdistana Tirkiye), hebûn. Ev civîn ji 18 ta 24ê nîsanê li bajarê Barselonayê, paytexta Navçeya xweser (otonom) a Kataloniyayê li Spanyayê çêbû. Civîna payîzê jî her li wî bajarî bi arîkariya hikûmata xweser a katalanî çê dibe û ewê li ser peyvnasiya (termînolojiya) siyasî û îdarî be.

Her Kurdek dikare pirs û pêşneyarên xwe yên li ser rastnivîsîna ziman ji "Komisyona kurmancî" ya Enstîtuyê re binivîse. Em hêvîdar in ku her Kurdê ku pê diqede dê arîkariya vê xebata bingehî bike. Bila pirsa ziman bibe ya heryek ji me, ya me hemûyan, pirsek neteweyî. Tenê bi vî awayî emê bikaribin di nav salan de kurmanciya me ya şêrîn ji talûke û gemaroyê rizgar bikin.

KURMANCÎ

Encamên civîna Barselonayê

Nivîskar, rojnamevan û zimannasên kurd ên ku ji 18 ta 24ê nîsanê li bajarê Barselonayê (paytexta Katalonyayê) li ser pirsên rastnivîsîna kurmancî xebitîn gihane encamên (netîceyên) ku em di rûpelên vê rojnameya taybetî de belav dikin. Ewê Enstîtu piştî her civîneke zimanî hejmareke vê rojnameya *Kurmancî* derîne.

RASTNIVÎSÎNA JIMARAN

0	Sifir (Nîn)	**16**	Şazdeh
1	Yek	**17**	Hevdeh
2	Du, dido	**18**	Hejdeh
3	Sê, sisê	**19**	Nozdeh
4	Çar	**20**	Bîst
5	Pênc	**21**	Bîst û yek
6	Şeş	**30**	Sî
7	Hef	**31**	Sî û yek
8	Heşt	**40**	Çil
9	Neh	**50**	Pêncî
10	Deh	**60**	Şêst
11	Yazdeh	**70**	Heftê
12	Dozdeh	**80**	Heştê
13	Sêzdeh	**90**	Nod
14	Çardeh	**100**	Sed
15	Panzdeh	**101**	Sed û yek

200 : Du sed; **1000**: Hezar;
1 000 000: Milyon; **1 000 000 000**: Milyar;
1 000 000 000 000 (1 000 milyar): Trîlyon

JIMARÊN RÊZÊ

1. Yeka	yekem	yekemîn
2. Didoyan	duyem	duyemîn
3. Sisêyan	sêyem	seyemîn
4. Çaran	çarem	çaremîn
5. Pêncan	pêncem	pêncemîn
6. Şeşan	şeşem	şeşemîn
7. Heftan	heftem	heftemîn
8. heştan	heştem	heştemîn
9. Nehan	nehem	nehemîn
10. Dehan	dehem	dehemîn
11. Yazdehan	yazdehem	yazdehemîn
20. Bîstan	bîstem	bîstemîn
30. Siyan	siyem	siyemîn
40. Çilan	çilem	çilemîn
50. Pênciyan	pênciyem	pênciyemîn
60. Şêstan	şêstem	şêstemîn
70. Heftêyan	heftêyem	heftêyemîn
80. Heştêyan	heştêyem	heştêyemîn
90. Nodan	nodem	nodemîn
100. Sedan	sedem	sedemîn

NAVÊN COXRAFÎ




AMERÎKA

Kanada	Otawa
Alaska	Xelîca Alaskayê
Dewletên Yakbûyî yên Amerikayê	Waşîngton (Washington)
Kuba	Havana
Haîtî	PortoPrens
San Domînîk	Santo Dominigo
PortoRîko	SanJuan
Antîlên Mezin	
Antîlên Biçûk	
Meksîka	Meksîko
Belîz	
Belmofan	
Guatemala	Guatemala
Salvador	San Salvador
Hondûras	Tegucigalpa
Nikaragua	Managua
Kosta Rîka	San Jose
Panama	Panama
Kolombya	Bogota
Venezuela	Karakas
Brazîl	Brazîlyla
Giyana	Corc Tawn-Amazon
Sûrînam	Paramarîbo
Giyena Fransayê	Kayen
Ekwador	Kîto
Perû	Lîma
Bolîvya	La Paz
Paraguway	Assunsiyon
Arjantîn	Buenos Aires
Ûrûguway	Montevîdeo
Şîlî	Snatiyago
Girava mezin a Agiristanê	
Tengava Macelan	
Malvînas (Falkland)	Stanley
Xelîca Sen Xorxê	
Xelîca Korkovado	
Girava Corciya Başûr	
Tengava Dêwan	
Antîlên Başûr	
Welatên Graham	

EWROPA

-Fînlanda	Helsinkî
-Swêd	Stokholm
-Norwej	Oslo
-Danmark	Kopenhag
-Îsland	Reykyawîk
-Gronland	
-Faroarna	
-Brîtanya Mezin	London
-Îngilîstan	
-Îrlanda Bakur	Belfast
-Skotland (Scotland)	Glasgow
-Wêls	
-Îrland	Dublin
-Polonya	Warşova
-Çekoslovakya	Prag
-Romanya	Bûxarest
-Macaristan	Budapest
-Bulgaristan	Sofya
-Yunanistan	Atîna

-Albanya	Tîrana
-Yûgoslavya	Belgrad
-Otriş	Viyen
-Lîxtinştayn	
-Îtalya	Roma
-Malta	Valleta
-Sardînya	Kyalerî
-Korsîka	Bastya
-Swîs	Cenev
-Fransa	Parîs
-Monako	Monte Karlo
-Spanya	Madrîd
-Andora	
-Portugal	Lîsbon
-Almanya	
-Rojhelat	Berlîna Rojhelat
-Almanya Rojava	Bon
-Luksembûrg	
-Beljika	Brukesl
-Hollanda	Amsterdam





ASYA


Afxanistan	Kabul
Pakistan	Îslamabad
Hind	Delhî
Srî Lanka	Kolombo
Bengladeş	Dakka
Bûrma	Rangûn
Tayland	Bangkok
Kamboçya	Phnom Pen
Laos	Viyang Şan
Viyetnam	Hanoy, Ho Şî Mîn
Maleziya	Kuala Lumpur
Sîngapûr	
Endoneziya	Cakarta, Bandûng
Gineya Nû	Port Moresbî
Awistralya	Sîdney (Sydney)
Zelanda Nû	Wellington
Kaledonya Nû	Nûmeya (Noumea)
Giravên Silêman	
Fijî	
Filîpin	Manîla
Taywan	Taypê
Hong Kong	Viktoriya (Victoria)
Çîn	Pekîn (Beyjing)
Nepal	Katmandû
Bûtan	
Moxolistan	Ûlan Batûr
Koreya Bakur	Piyongyang
Koreya Başûr	Seûl
Japon	Tokyo
Yekîtiya Sovyetî	Moskov

AFRÎKA

Misr	Qahîre
Lîbya	Trablûs
Tûnis	Tûnis
Cezayir	Cezayir
Mexrib (Marok)	Rebat
Sehra	
Sehraya Rojava	El Eyûn
Giravên Kanariyê	
Morîtanya	Nûakşot
Malî	Bamako
Senegal	Dakar
Gambiya	Banjûl
Gîneya Bisao	Bîsao
Gîne	Konakrî
Siyera Leon	Frîtawn (Free Town)
Lîberya	Monrovya
Kotdîvuwar	Abidcan
Gana	Akra
Bûrkîna Faso	
Voltaya Jorîn	Wanadûgû
Togo	Lome
Benen	Kotonû
Nîjerya	Lagos
Kamrûn	Yaûnde
Gîneya Ekwatorî	Malabo
Nîjer	Niyamey
Çad	Nicame`na
Sûdan	Xartûm
Afrîka Navendî	Bangî
Etyopya	Adîs Abeba
Erître	Esmere
Cibûtî	Cîbûtî
Somalya	Mogadîşû
Kenya	Nayirobî
Ûganda	Kampala
Rwanda	Kîgalî
Brundî	Bujumbura
Tanzanîka	Dar Es Selam
Malawî	Blantîre
Mozambîk	Mabûto
Madagaskar	Antana Narîvo
Kanala Mozambîkê	
Girava Rewinyon	
Girava Morîs	
Zengîbar	Zengîbar
Zîmbabwe	Salsbûry
Swaziland	Mbabane
Lesoteo	Maserû
Afrîka Başûr	Pretorya
Botswana	Gabaron
Namîbya	Windhûk
Zambiya	Lûsaka
Angola	Lûanda
Zaîr	Kînşasa
Kongo	Brazîl
Gabon	Librvîl

OQYANÛSYA

Antartîka
Oqyanûsa Arktîk
Polînezya
Mîkronezya
Melanezya



TIRKIYE	IRAQ	SÛRIYE	ÎRAN
Enqere	Bexda	Şam	Taran
Edene	Besra	Heleb	Tewrêz
Stembol	Kerbela	Hums	
Qeyserî	Kûfe	Lazkiye	
Qonya		Dêrezor	
Antaxya			
Îskenderûn			

ROJHELAT

Lubnan	Beyrûd	**Mîrîtiyên Erebî yên Yekbûyî**	Ebû Zebî
Îsraîl	Tel Avîv - Quds	**Bahreyn**	Mename
Urdin	Amman	**Uman**	Mesqet
Kuweyt	Kuweyt	**Qibris**	Levkosia
Erebistana Seûdî	Riyaz	**Yemena Başûr**	'Eden
Yemena Bakûr	Sen'a	**Qetar**	Dohe
Dubey	Şarîqe		

DEMÊN SALÊ

Di salê de çar **dem** an werz (mewsim) hene:
BIHAR, HAVÎN, PAYÎZ û ZIVISTAN
Her dema salê sê meh dom dike.

Mehên biharê: Adar, Nîsan, Gulan
Mehên havînê: Hezîran, Tîrmeh, Tebax
Mehên payîzê: Îlon, Çirî, Teşrîn
Mehên zivistanê: Kanûn, Çile, Sibat

NAVÊN MEHAN

kurdî	*almanî*	*fransizî*	*îngilîzî*	*tirkî*
Çile	Januari	Janvier	January	Ocak
Sibat	Februar	Février	February	Şubat
Adar	März	Mars	March	Mart
Nîsan	April	Avril	April	Nisan
Gulan	Mai	Mai	May	Mayıs
Hezîran	Juni	Juin	Juni	Haziran
Tîrmeh	Juli	Juillet	July	Temmuz
Tebax	August	Août	August	Agustos
Îlon	September	Septembre	September	Eylül
Çirî	Oktober	Octobre	October	Ekim
Teşrîn	November	Novembre	November	Kasım
Kanûn	Dezember	Décembre	Decembe	Aralık

ROJÊN HEFTÊ

Gotina **hefte** ji jimara heft tê, bi xwerû kurdî ye.
Di **hefteyekê** de heft roj hene. Va ne navên rast ên van rojan û wergerandina wan a bi zimanên biyanî:

kurdî	*almanî*	*fransizî*	*îngilîzî*	*tirkî*
Yekşem	Sonntag	Dimanche	Sunday	Pazar
Duşem	Montag	Lundi	Monday	Pazartesi
Sêşem	Dienstag	Mardi	Tuesday	Salı
Çarşem	Mittwoch	Mercredi	Wednesday	Çarşamba
Pêncşem	Donnerstag	Jeudi	Thursday	Perşembe
Înî	Freitag	Vendredi	Friday	Cuma
Şemî	Samstag	Samedi	Saturday	Cumartesi